Cihê pevguhestinê a Sankt Augustin ê

Cînarên me gelekî hemerengin (Pirrengin, cure-cure ne). Hinek ji wan hertim li vir jiyane, û hinekjî malên xwe anîne vir û dijîn. Hink ji wan vêgavê li Sankt Augustin dijîn, jiber ji welatên xwe reviya ne û penaber bûne.

Em dixwazin pêşwaziyê li mirovan (însanan) bikin, herwise ji bo we jî pêşwaziyê rêkbixin, daku bajarekî pirrengîn sazbikin û birêve bibin.

„Em“, kesên xwepexşin yên, ku alîkariya penaberan dikin û dezgehên (Tîmên, taximên) karê xweguncandinê (integration) û pilandananên karê civakî yên bajarê Sankt Augustin ê.

Cînarên nû ji hemû cîhanê (hemû welatan)

Em: Erebin, Afrîqî ne, filehin, Iranî ne, Misilmanin, Kurdin, Afxanî ne, êzîdî ne, durzî ne, bahaî ne…

Em baweriyê bi: Mirovayetiyê, amadebûn jibo alîkariyê, hevdûqebûlkirin ê, Rastgoyî, hevaltî, Xwedê, Allah …tênin.

Em li: mala, kar, piştgirî, hevalan, welatekî nû jibo me, û malbatên me, mêr, jin, zarok, bêtirs, bê zordestî, bê çewsandinê… digerin.

Em tiştên ku dikarin, zanebûna xwe, jêhatbûn û taqeta xwe, vîn û cesareta xwe, dilxweşiya xwe… pêşkêş dikin.

Jiber em dixwazin: bi we re kar bikin, bi we re cejnan pîroz bikin, bi we re kêf û şadiyê bikin, bi we re şînê bikin, tiştên li ba xwe bdine we, tiştekî ji we nastênin, we baştir nasbikin û li we têbighêjin, û herwise jî win li me baştir têbighêjin.

Cînarên nû ji Sankt Augustin ê

Em: ew kesên, ku ji kevin de li Sankt Augustîn ê dijîn (xwediyê cihin), yên ku ji deverên din hatine vî bajarê, eleman, ne eleman, nûnerên gelek olan (dîn, mezheb), yên bê ol (bawerî, xwedê nenas), xwedî Malbat, yên bi serê xwe ne, yên duqolî bi hevre dijîn…

Em baweriyê bi: hezkirina ji kesên din, Mirovayetiyê, amadebûn jibo alîkariyê, hevdûqebûlkirin ê, bawerî bi hevanînê, Rastgoyî, xweda yên cuda (başqe) di vê cîhanê de …tênin

Em li danûstandinê, li piştgiriyê û li hevalan digerin.

Em pêşkêş dikin: welatê me binasin, jiyana me binasin, civak û kulturên me binasin, û herwise jî bûyerên hevbeş, alîkarî û piştgiriya me li her cihê ku pêwist be.

Em dixwazin û hêviyên me ewin, ku we nasbikin, jiyana we, welatên we, kulturên we, hêviyên we; win ji çi hez dikin û ji çi hez nakin, çi hêvî û meremên we hene…

Em dixwazin nîşanî we bidin: em kîne, jiyana xwe, kultura xwe, hêviyên xwe, em ji çi hezdikin û ji çi heznakin, çi hêviyên me hene…

Em dixwazin bi wer e bijîn, neku li tenişta we bin, em bibne hevwelatî û hevalên we.

Win dixwazin bi dilxweşî alîkariyekê bikin, yanjî cînarên nû nas bikin?

Weke nemûne win dikarin li vir başiyekê (qenciyekê, alîkariyekê) bikin: xwedîlêderketin (guhdan), alîkariya taybet, çalakiyên hevbeş di demên valehiyê de, bi kirêdana malan û hwe…

Heger pêwistiya we bi piştgiriyê hebe, win dikarin wê yekê bixwazin.

Em alîkarî û piştgiriyê jibo we û zarokên we pêşkêş dikin, alîkarî jibo fêrbûna zimanê elemanî.

Win dikarin yekser pêwendî bi me re bikin!

Christina Müller, Rêkxera xwepexş di rêxistina alîkariya koçberan de, Tel.: 02241/243-540, E-Mail: c.mueller@sankt-augustin.de, Markt 1, Zimmer 613, 53757 Sankt Augustin.

Ev Proje ji alîkariya hevbeş a Mirovên xwepexş di rêxistina alîkariya koçberan de li Sankt Augustin ê (di nav wan de jî Tîma Schützenweg, Aktion Neue Nachbarn, TV Hangelar uvm.) û herwisa jî rêveberiya bajarê Stadt Sankt Augustin ê.

Sankt Augustin alîkariya koçberan dike – Em kesên alîkar tênin ba hev (wan dicivênin).